

## Mela Hesen Şêweselî:


# Ya Xwedê neyar qet negîjin hêvî û mirazên xwe

3

## Îbrahîm Hecîc:

# Min cotek pêlavên "Kilaş" ji Dr. Qasimlo re çê kirin

8




Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (206) 21-05-2013 Buha (150) Tûmen


### Salvegera avakirina "Tshk TV" pîroz be

Roja 3'ê Cozerdanê salvegera avakirina TISHK TV , ye. Ew televîzyona ku reng û dengê rastîn ê gelê Kurd li her ciheke Kurdistanê, bi taybet li Kurdistana Îranê ye. ew televîzyon niha êdî mêhvanê malên her Kurdekî ye, û bûye çiqla nav çavê neyarên Kurd. lewra jî xortên Kurd ji vê televîzyonê xwedî derdikevin, û wek çavê xwe vê diparêzin.



## Beyta Rêberî Serkomar Diyarî Dike

2



## Petrol çekek bihêz di destê Kurdên Sûriyê dwe

6



## Qehremanên Cînayetan

7



## Hevalbendiya leşkerî dijî Îranê

7

## Biryara Şêvra Nobedar:

# Refsencaî û Meşayî bêjinga serkomariyê re derbaz nebûn




Piştî vê ku çavê tewaya xelkê Îran, Kurdistan û herêmê li biryara dawiyê ya Şêvra Nobedar a Komara Îslamiya Îranê bû, wezareta navxwe ya vê rejîmê ragehand ku Şêvra Nobedar biryara xwe ya dawiyê derkir û ji wan 466 kesan, tenê heşt kes hêlan.

Di nav wan berbijarên ku kêrhatiya wan hate retkirin, Haşimî Refsencan û Meşayî jî hebûn. Her di pêwendî tevî vê bi nav hilbijartinê PDKÎ û Komelê jî daxuyaniyek derkirin û di vê daxuyaniya xwe de ragehandin ku tehrîma hilbijartinê ji aliyê xelkê Kurdistanê ve dikare helwesta herî bi cî be. Berfirehiya vê daxuyaniyê li rûpela 2'ê de hûn dikarin bibînin û bixwînin.

Agirî di malpera "www.Kurdistanmedia.com" de bixwînin.

Herweha nûçeyên curbicur û gotarên Agirî di malpera "www.Agirîmedia.org" de jî hûn dikarin bixwînin.


AGIRÎ

www.arsivakurd.org

# Germahiya Hilbijartinê

Şehab Xalidî

sergotar

Di Îrana ku hejarî, bêkarî û giranî bêdadiyê dike, îro rojê basa herî germ li jêr propagendeyên bihêz ên ragehandinên giştî ên Îranê de, basa hilbijartinê ye. Reformxwaz radigehînin ku ew rewşa herî xirap ya aborî û siyasî tenê bi destê wan dikare çareser be, bingehxwaz (Usulgera) xwe wek parêzerê rastîn ê nîzama Îslamiya Îranê û deskevtên wê dihesibînin û niha êdî Ehmedînijad jî bi girûpa xwe ya ku wek tevgera Înhirafî (lader) hatiye naskirin, radigehînin ku ew dê bikarin li pêşerojek nêzîk de rewşa welat di her warekî de pêş bixin, helbet heke bikarin posta serkomariyê bidest bixin.

Di rastî de ya ku rohn û zelal e, ew e ku şerê wan aliyan ne li ser nehêlana hejariyê û rêzgirtina ji dengê xelkê û paqijkirina welat ji gendelî û maddeyên hişber e. Şerê wan ne li ser vegerandina keniyekê li ser lêvên xelkê perşîan û bêçare yê welat e. Belkû şerê wan li ser parastina vê nîzamê, û li ser diziya zêdetir ya wan sermayeyên jêrerdî ye ku me bas kir.

Ji aliyek din ve li hilbijartina serkomariyê ya dewra pêştir de me dît ku Xamineyî û şêvirmendên wî bi endazyariya hilbijartina pêşîn a serkomariyê, çawan bi bê hijmartina dengan, Ehmedînijad di sindûqên dengdanê de derxistin. Lewra vê carê jî bi wan îmkanatên bê qas û firt û fêlên ku li jêr serê wan de ye, bê guman her demekê dikarin kesê dilxwaze rêber ji sindûqê derxînin, lewra em dixwazin vê yekê û vê rastiyê bêjin ku bo rejîma Îranê ya herî giring ew e ku xelkekî zêde li ser sindûqên dengdanê amade bin, û ew jî bi cîhana derve ragehînin ku xelkê me ji nîzama xwe hez dike û weha bi coşek bê mînak ve di hilbijartinê de beşdariyê dike. Lewra eva armanca sereke ya rejîmê ye, û divêt her kes vê rastiyê berçav bigre û piştre biryara xwe bide.

# Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Komele:

## "Baykota hilbijartinê helewsta herî baş e"

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, di daxuyaniyeke hevpar de tehrîmkirina hilbijartinên dewra 11'ê ya serkomariyê wek helwesta herî di cihê xwe de, dan zanîn ku dikare peyama herî mezin ya xelkê Kurdistanê be. Eva jî deqê vê daxuyaniyê:**

**Hemwelatiyên rêzdar!**

**Gelên bindest ên Îranê! Neteweya**

**Azadîxwaz a Kurd!**

Rejîma Komara Îslamiya Îranê li Cozerdana sala 1392'an (2013'ê) de 11'emîn dewra hilbijatinên serkomariyê birêve dibe. Vê carê jî weke her tim bi rêxistina pîlan û şanogeriyên curbicur dixwaze weha nîşan bide ku di nav sîstema Komara Îslamiya Îranê de, û li çarçoveya Wilayeta Feqîh de, derfeta hilbijartinek dadperwerane heye, û berpirsyarên îdarî û Şorayên herêmî ên rejîmê ji riya hilbijartinê ve û bi deng û îradeya xelkê tên destnîşan kirin, û dixwazin bêjin ku modêla xelkserdestiya wîlayeta feqîh, modêleke serkevtî û îroyîn e, û bi çavgirêdana xelkê, weha nîşan didin ku îrade û dengê xelkê li nav hikumeta Komara Îslmaî de rol û dengê xwe heye.

Guman têde nine ku hilbijartinên vê carê jî wek dirêjiya pêvajo û deshilata Komara Îslamiya Îranê bêpar e ji her cure pirensîpeke demokratîk û hilbijartineke azad û naskirî di cîhanê de.

Di rastî de beşeke herî zêde a xelkê Îranê û nûnerên rastîn û ji wan neteweyên bindest ên Îranê, û cudabîrên siyasî û ayînî û kêmaniyên ayînî û ên din her bi derba yasayên dijî demokratîk ên deshilata siyasî hatin avakirin û li ser bingeha îdeolojiya wîlayeta feqîh ji mafên demokratîk ên xwe hatin bêpar kirin. Hewceyê basê ye ku bernameyên bi nav hilbijartinê her di destpêkê de li beyta rêberî û destûpêwendiyên wan wek wezareta Îtilaat û sipaha pasdaran de dest pê dike, û her li wir jî bidawî tê.

Weliyê Feqîh ji rûyê mîkanîzmên li ber destê xwe berbijarên xwe diyarî dike, û heya vê cihê ku bikare cudabîran ya cudahîxwazan vêde dibe, û şêwaza propagendeyên hilbijartinê diyarî dike. Îmkanatên hikumetî ji riyên curbicur ve dêxne xizmeta berbijarên dilxwaz ên xwe, û bi gefxwarinan û baskirina vir û derevan dengan ji bo kesên dilxwaz ê xwe kom dikin û li roja dengdanê de bi pîlanên curbicur kesên weha tînne ser sindûqan, û heta bi wan destêwerdan û xapandinan jî razî nabin, û destêwerdanê li nav piroseya hijmartina dengan, û heta hewce be, bi saxtekariya milyonî enama hilbijartinê bi dilê xwe diguherin, û bi vî awayî kesên cihê bawera wîlayeta Feqîh ji sindûqan derdixin. Her wek em dizanin posta serkomariyê û ew postên din jî ku li Komara Îslamiya Îranê de, bi nav hilbijartinê jêre birêve dibin, rolek weha li siyaseta giştî û sitratejîk a Îranê de nine, û li rastî de tenê birêveberê biryarên rêber in, ku ew jî xwe li serveyî tevaya yasa û rêsayan ve dibîne, û îdiaya nûnertiya Xwedê dike. Ew kesên ku li vê dewrê de jî beşdar in û li qada rikeberiyê de dixwazin rolê xwe bilîzin, her hemû jî ji mohreyên serekî ên rejîm li heyamê zêdetir li 30 salên borî de ne, û destê wan li tawan û talan û serkût û îşkence û terorê de hebûye, û hinek jî darêjer û bernamedanerê wan tawanan bûne.

**Civatên xelkê Kurdistanê!**

Bi nav hilbijartinên vê carê jî bona diyarîkirina serkomarî û herweha şorayên gund û bajaran, wek tevaya şanogeriyên dîroka Komara Îslamî de, ne pêver ên hilbijartina azad û dadperwerane têde ye, û ne jî dengê xelkê ên rastîn bi sedema wan astengên ku danîne, dikare rolê xwe ê rastîn bilîze, herweha ne jî ew kesên ku wek serkevtiyê pêşbaziyê tên ragehandin, deselatek weha dibe. Lewra hilbijartina serkomariya vê carê jî bi wan sedeman li gel berjewendiyên rastîn ên we yek nagre, û li gel daxwazên rewa ên we, û li gel nîve demokrasiya welatên paşketî jî yek nagre.

Hevdem tu yek ji wan propagendeyên wan bi qazancê xelkê Kurdistanê ninin, û nikarin tu guherînekê bi qazancê xwastekên gelê Kurd pêk bînin. Kevne pasdar û terorîstên dîroka sê dehikên vê deshilatê ciyê hêviyê û peyamînerê pêşerojek zelal nînin bo civaka Îran û Kurdistanê.

Lewra em li ser vê baweriyê ne ku tehrîmkirin û beşdarînekirin li 11'emîn dewra serkomariyê ku roja 24'ê Cozerdana îsal birêve diçe, helwesta herî bi cî ye ku dikare meztrîn peyama siyasî ya xelkê Kurd bigehîne guhê deshilatê û bîrûraya giştî a cîhanê ku ferq û cudahîdanîn û sitem û bêparkirina siyasî divêt bi dawî bê.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Komeleya Şoreger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê**
**31. 02.1392**
**21.05.2013**

www.arsivakurd.org

Mamosta Mela Hesen Şêweselî endamê îftixarî ê Komîteya Nawendî ya PDKÎ, di fayleke dengî de bas ji hinek ji bîreweriyên xwe kirine. Bi taybetî navbirî bas ji dewrana pêşmergatiya xwe û hevaletiya bi Mamosta Hêminê helbestvan re kiriye. Wî di vê fayla xwe ya bi deng de, hinek şaşiyên dewrana pêşmergatiyê jî rast kirine. Lewra me bi hewce zanî ku her carê beşeke wan bîreweriyên navbirî li Agirî de biweşînin.

Beşa 1'ê:

# *"Şîva Xerîban û hilverîna pelgan"*



Birêz Mela Hesen Şêweselî

**Yên toyê nakokî û tevdanîkariyê diçînin, û zarokên bin lepan, ên perîşe û bêçare diberde canê hevudin, û di nav kûrahiya evîndariya her takekî de rolê merg û mirinê dilîzin, ya xwedê, bila qet nagîjin hêvî û mirazên xwe...**



**Şehîd Dr. Qasimlo û birêz Mela Hesen Şêweselî di dema pêşmergatiyê li çiyayên Kurdistanê de**

Ji mêjve ye ku li ser rûyê vê cîhanê dijîm, û bo talliya karesatên nexweş ez mame. Ji bilî tirajidiyan tu tiştek din li tûrkê min de nine ku ez ji we re bas bikim. Carê ez her vê yekê dibêjim ku yên toyê nakokî û tevdanîkariyê diçînin, û zarokên bin lepan, ên perîşe û bêçare diberde canê hevdu, û di nav kûrahiya evîndariya her takekî de rolê merg û mirinê dilîzin, ya xwedê, bila qet negîjin hêvî û mirazên xwe. Min gellek caran destewaje û peyva "Şîva Xerîban" ( Şamê Xerîban), ji dûr ve bihîstibû, û gellek caran jî min ji dûr ve dîtibû ku rêûresma wê li meha Moheremê de, ji aliyê birayên Şîe ve birêve diçû, lê tu car bi kiryar ez li "Şîva Xerîban" de beşdar nebibûm, di rastî de min tama tehil ya Şîva Xerîban tam nekiribû, û min nedizanî ku Şîva Xerîban çi sîxeyek e...

Min rast negotiye we, heke ez bêjim ku ez ji nazikî û xweşikiya helbestên mam "Hêmin" têgihîştibûm, lê ez her li zarokatiya xwe de bûme evîndarê helbestên wî, û kêmekê jê halî dibûm, û min kêmekê hest bi sadeyî û rewaniya wan dikir, û piştre ji bo nivîsandin û bilavkirina wan ez ketim nav hewildanan, û heya qasekê ez li vî karî de serkevtî bûm.

Aqibet min mam Hêmin dît û li dûr ji welat pêre nasyar bûm. Min kak "Elî Heseniyanî" jî, ji riya helbestên wî ve nas dikir.

Piştre ez li Sablaxê, li nivîsîngeha hejmar 4 ya tomarkirina belgeyan û emlakan de, ku ez bi awayek ne fermî mîrzayê vê nivîsîngehê wate monşî bûm, ez gihîştme xizmeta nemir Kak Elî Heseniyanî. Min dixwast ku li wir de vê yekê zêde bikim ku ew defterxane ku cihê nivîsandina senedên tomarkirî bû, û herweha cihê guherîna danûsitandinên curbicur bû, ez bi gelek kesan dame nasîn, û min gellek kes jî ji wir ve nasî. Kak Silêman Çîre riha wî şa be, ku çend roj berî niha koça dawiyê kir, û wê demê li girtîgeha rejîma paşatiyê de bû, ji riya birayên wî kak Mihemedemîn Çîre, û kak Qasim Çîre, ku heyamê salekê li girtîgeha Qerax Behra Urmiyê hevbendiyê min bûn, min nas kir. Min tu car bawer nedikir ku rojekê em hevudin bibînin, ew jî li kuderê? Li çiya û dol û ...

Piştî damezrandina Hikumeta Komara Îslamiya Îranê û xwegirtina vê dwletê ku mîratgirê rejîma paşatiyê bû, Xumênî biryara cîhadê bi dijî gelê Kurd derkir. Qarnê û Qelatan hate komkujkirin, û piştî vê artêş û sipaha pasdaran û besîcî û heta xelkê şexsî ên ser bi rejîmê wek hêzeke dagîrker a bêrehmane, wek Mixolan û gellek hovane êrîşî ser gund û bajarên Kurdistanê kir.

**Hêla ew paşvekêşana taktîkî bidawî nehatibû, û PDKÎ mijûlî veguhastina kelûpelan û xwe rêkxistina di gel rewşa wê demê û xwe amadekirin bo berberekaniya di gel şerê sepandî bi ser Kurdistanê de bû, ku rejîma Komara Îslamiya Îranê ji vê helwesta hêzên Kurdistanî, mifaha şaş wergirtin û hêzên xwe şandin her nuqteyeke Kurdistan**

Biryara cîhada Xumênî li 28'ê Gelawêja 1358'an(1979) de hate derkirin, lê berî vê biryarê PDKÎ hest bi berpirsayetiyê kiribû û bona xweparastin ji şer û xwînrêjiya nav bajaran, biryara paşvekêşana xwe dabû. Lê hêla ew paşvekêşana taktîkî bidawî nehatibû, û PDKÎ mijûlî veguhastina kelûpelan û xwe rêkxistina di gel rewşa wê demê û xwe amadekirin bo berberekaniya di gel şerê sepandî bi ser Kurdistanê de bû, ku rejîma Komara Îslamiya Îranê ji vê helwesta hêzên Kurdistanî, mifaha şaş wergirtin û hêzên xwe şandin her nuqteyeke Kurdistanê, û xwe gehandin cihên hestyar ên sînorê navbera Îran û Îraqê. Wan dixwast ku tewaya riyên mêhwerî bi dirêjahiya sînorê Îran û Îraqê bigre û bi vî awayî xelkê Kurdistanê dorpêç bike, û merema wan ji paksaziyê jî heman kuştara xelkê bê tawan ê Kurdistanê bû. Wan li gorî yasaya daristanê, wate wek bixwe dixwastin ew komkujî encam dan...

www.arsivakurd.org

# Amerîka firotina zêr bo Îranê qedexe kir



**Kurdistanmedia: Amerîka li belgeyekê de firotina zêr bo Îranê qedexe kir û herwusa du kompanya jî li "Dobêy" bi tawana hevkarîkirin tevî rejîma Îranê, xiste nav lîsteya tehrîmên xwe de.**

Li gor yasayekê ku ji aliyê Amerîkayê ve hatiye pesendkirin, ji meha "Juen" ve tu dewletek nikare pêywendiyên kirîn û firotina zêr tevî Îran hebe.

Li gor vê yasayê her dewletek ku berevajiyê biryara han bilivlve, dê bikevne nav lîsteya gemaroyên Amerîka de.

Her di vî warî de, dewleta Amerîka du kompanyayên "Elhelal û Elfida" li Dobey bi tawana peywendiyên bazirganî tevî Îranê, xiste nav lîsteya gemaroyên xwe de.

"Dîvîd kohen" cîgirê xezanedariya Amerîka ragehand," ev gemaroyên ku danîne ser Îranê bandora xwe derxistiye û arîşe bo hinartin û firotina petrola Îranê çêkiriye".
Çend roj berî niha pênc sinatorên Amerîka di belgenameyekê de pêşniyar kiribûn ku hisabên bankî ên Îranê ku ji dahata "Erzî" ve çavkanî digrin, û li dervey Îranê ne, bên bilokekirin.

heke ev gelale ji aliyê Barak Obama ve bê vajokirin, Banka Nawendî ya Îranê û kompanyayên petrola rejîma Îranê nikarin hisabên bank li derve bikar bînin.



# Rewşa aloz ya Rojhilata Navîn

Orhan Monezemî



Herwek em dizanin çendîn sal in ku Rojhilata Navîn bûye binkeya girûpên terorîst ên mîna Elqaîde û hêza Quds a Îranê û gellek girûpên tundrew. Gelo sedema wan arîşeyên ku di wê deverê de çê dibin, çi ne? Gelo kî berpirsyar e? Ew xelkê sivîl ku yê welatên Rojhilata Navîn, çima dikevine ber êrîşên terorîstî? Ma gelo fermana qirkirina mirovan dane destên wan terorîstan? Her roj em di TV û çapemeniyan de dibînin û dixwînin ku di çend welatên li Rojhilata Navîn wekî Efxanistan û Îraq û Pakistan û Sûriyê de, xelkên sivîl dikevine ber êrîşên terorîstan. Herwek em dibînin li Rojavayê Kurdistanê jî her roj dehan kes canê xwe ji dest didin û xelkê sivîl dibin armanca wan kar û kiryarên terorîstî, ku beşek berçav ji wan kiryarên terorîstî destê Îranê têde heye.

Ma heta kengî ew komkujî wê bên encamdan? ka ew welatên ku bas ji demokrasiyê dikin, ma heta kesek yan welatek berjewendiya xwe têde nebe, nabe alîkariya xelkê sivîl bikin. Heta niha çend caran hatiye ragihandin û bi vîdyo û belgeyan nîşan dane, û hatiye eşkerekirin ku çekên kîmyayî li Sûriyê hatine bikaranîn, lê deshilata her welatekê daxuyaniyekê dide û dibêjin heta Beşar Esed hêla sor derbas neke, em çi biryarekê derbarê wê çendê nikarin bidin. Di hemberî wê de jî siyaseta Îranê ew e ku ew welat xaleka stratêjîk e jî bo vê çendê ku bikare gefên Îsraîlê bersiv bide, û her roj destêwerdanê dike di nava axa Sûriyê de, û rewşê ji welatiyên Sûrî bi taybetî Kurdan re xirabtir dike, û bi şandina sipahiyên Quds yan besîcan destêwerdanê li axa Sûriyê bi xasmanî di nav herêmên ku kurd têde dijîn, dike.

Her wekî em dibînin pêvajoya aşîtiyê jî li Kurdistana Bakûr her roj gavên berfireh diavêje û ew pêvajo dikare Kurdên Kurdistana Rojhilaat jî hişyartir bike.

Ger Kurd di wê pêvajoyê de serkevtî bin, û neyên xapandin, wê rola Kurd di Rojhilata Navîn de wê zêdetir berçav be. Di çendîn sedsalên borî de jî, Kurd her hatiye xapandin û axa Kurdan perçe perçe bûye. Ji ber vê yekê ye ku Îran naxwaze Kurdistan ava bibe, û her roj destêwerdana welatên cîran dike daku rewşê ji wan welatên ku Kurd tê de dijîn, aloztir bike. Ji aliyê din ve, di wan rojan de em dibînin ku balafirên Îsraîlê navendeke lêkolîna Artêşa rêjîma Sûriyê bombebaran kir û di encama wê de jî, peyvdarê wezareta derve ya rêjîma Îranê, wate Mêhmanperest ew yek bi tundî şermezar kir û daxwz ji welatên derdorê kir ku piştevaniya Îranê bikin da ku ew êrîşa Îsraîlê şermezar bikin. Ew êrîşa balafirên Îsraîlê ji ber vê yekê ye ku di wan navendên lêkolînên artêşê de mûşekên "fatih" ên Îranê têde hebûn, ku bi awayekî rêjîma Sûriyê dixwest wan bide destê Hizbulahê, ku ew yek jî bo Îsraîlê metirsîdar bû ku ew çekên giran bikevine destên komeke weha terorîstî de. Vê yekê jî çendîn dijkiryar li pey xwe re anîn.

Ji ber kirîza Sûriyê ku 2 salan pitir e, zêdetir ji 70 hezar kesan jiyana xwe ji dest dane, gelek xelkê wî welatî mal û halê xwe bi cî hêlane û awareyî welatên derdor wekî Ordon, Îraq, Kurdistan, Lubnan û Turkiyê bûne, û rewşa jiyana wan pir xirab e. Em dikarin di dawiyê de weha bêjin ku heya destê girûpên curbicur ên ser bi welatên curbicur di nav vê kirîza Sûriyê de hebe, Sûriye ewlehiyê bi xwe ve nabîne. Lewra li vê rewşa pirr aloz de hewcehiya Kurdan di vê para Kurdistanê de ji her demekê zêdetir bi yekîtî û hevgirtinek rastîn heye, da ku vê derfeta dîrokî ji dest xwe dernexin, û bi hevre di vê derfeta dîrokî de kiyanekê û statûyekê ava bikin.

# Mano Xelîl li Munîxa Almanya bû yekem

Fîlma derhênerê kurd Mano Xelîl bi navê „Apê Îrbom" bi elmanî „Der Imker", xelata yekem a festîvala sînema li bajarê Munîxa Almaniya di beşê «sînema Alman» de bi dest xist. Di vê pêşberkê de 10 fîlm ji bo xelata mezin hatibûn hilbijartin.

Festîval di rojên 8-15 Gulanê de li dar ket.



www.arsivakurd.org

# 17’ê Gulanê Roja cîhanî ya peywendiyan





Arif vêlzî

Derketina alavên peywendiyê, bandorek berçav xistiye ser jiyana civakî û siyasî ya mirovan û bikaranîna rojane ya wan, gellek şûnwarên pozetîv weke bilindkirina asta rewşenbîrî, kurtkirina navberên cuxrafî, dahat, perwerde û fêrkarî, dabînkirina asayiş û ewlehiyê, wergirtina zaniyariyan û ...hwd ji xwe bi cih dihêle.

Afirandina alavên weke Têlêgraf û Telefonê, guherînkariyek mezin bû di jiyan rojane ya mirov û cîhana peywendiyê de. Lewma di yekemîn pêngava berevpêşveçûna cîhana peywendiyê de ku di sala 1865’an de xebatek zaf jê re hat kirin, “Yekîtiya Telêgraf a Navnetewî” hat avakirin. Piştî derbazbûna nêzîk bi 40 salan û di sala 1906’an de, yekîtiya navbirî di konfiransa xwe de biryar da ku yekîtiyek din bi navê “Yekîtiya Radyo û Telegraf a Navnetewî” ava bike. Pêştî sê dehikan xebata berdewam, her du yekîtiyan li jêr navê biryarnameya “Madrîdê” de lihev hatin û “Yekîtiya Navnetewî a Paywendiyên dûr” ava kirin.

Niha bi xweşî ve pêşkevtina teknolojî û geşekirina peywendiyan, gihîştiye astekê ku cuda ji vê yekê ku weke pîvana pêşkevtina welat di cîhana îro de tê hesibandin, belkî bûye sedema hêsankirina jiyana rojê û geşeyae çandî, û heta, bo pêşvebirina armancên siyasî û nasandina şunas û şiyanên netewî jî, alîkar e.

Eva ku li vir de em dixwazin bi hûrbînî ve lê binêrin, hewcehiya hebûna alavên peywendiyê di welatên dîktatorlêdayî û daxistî de ye, jiber ku bona jordebirina asta rewşenbîriya civakê û herweha bona xweşkirina rêya rizgarbûn ji sîstema narewa di welat de, rolek erênî û berçav dilîze.

Rejîma Komara Îslamî yek ji wan welatan e ku bona geşandina îdeolojiya xwe ya Îslamî, her di despêka hatine serkar a xwe de, li ser bingeha dijatiya ragehandina azad û alavên peywendiyên serdem, pêpikên desthilata xwe ava kirin. Lewma me dît ku ji rojnamegeriya azad ve bigre heya bikaranîna Setelayt û alavên din ên peywendiyê giştî hatin qedexekirin û bi hemû awayekê ket hewla sansorkirina rastiyên cîhana îro.

Eşkere ye ku di serdemê niha de ku bi serdemê Dîcîtalîbûnê hatiye naskirin, alava herî sereke û hewce li seranserê cîhanê ku bi hemû awayekê û bo hemû kesekê bi kar tê, Întêrnêt e. Lê mixabin di Îranê de ku xwediyê nifûsek 75 milyonî ye û li gor amaran 45 milyon kes ji vê nifûsê, bikarhênerê Întêrnêtê ne, di piraniya deman de bi taybet di 10 salên borî de, malperên weke Facebook, Yahoo, Google û nermefzarên VPN û... hwd dikevin bin sansor û fîltêrkirinê de, û bi vî awayî bikaranîna wan malperan nemumkîn dibe.

Eva ku cihê heyrînê ye ew e ku piştî hatine serkara Ehmedînijad heya niha, bi awayek berdewam nûçeya avakirina “Întêrnêta netewî” ku di cîhana modern a îro de bi apartayda dîcîtalî tê nasandin û bi tenê li welatê Koreya Bakûr de weha Întêrnêtek hatiye ceribandin, tê belavkirin. Serbarê piropagendeyên zaf ên karbidestên rejîma Komara Îslamî li dor bihêzbûna Întêrnêta netewî, şarezayên vî warî li ser vê baweriyê ne ku “Întêrnêta Netewî” dê bibe sedema vê ku Îran bi tewahî îzole bibe û ji tora zaniyariyên giştî ên cîhanê dûr bikeve.

Di dawiyê de bi liberçavgirtina vê rastiyê ku ragehandin û bitaybet Întêrnêt beşek sereke ji jiyana îro ya her miroveke ye, rejîma Komara Îslamî bi avakirina “Întêrnêta netewî” û sansora peywendiyên giştî, xelkê xwe li ragehandina serdem ku tijî ye ji zaniyariyên kêrhatî û nû, bêpar dike, heya ku bikare bi veşartina rastiyên navxwe û cîhana derve, bigije armancên xwe ên ne mirovî ku tenê û tenê parastina desthelatê û dizîna serwet û samana welat e.

## Nerîna Lîderan



Abdullah Gul

**Tirkiyê dewleta Tirkan e**



Ehmed Turk

**Dema vê hatiye ku Turkiye dawiyê bi haşakirina ji şûnasa Kurdan bîne**



Salih Muslim

**Kontorola %60 ji çavkaniyên petrola Sûriyê ketiye dest PYD’ê**



Mihemed Mehdî Axûndzade

**Para me li behra Xezer kêmtir ji Rûsiyê nine**

www.arsivakurdi.org

# Rojnameya Miliyet: *Sitratejiya nû a Erdoxan, geşandina têkiliyan bi Kurdan re ye*




**Taşbaş di şiroveya xwe ya li rojnameya Miliyet de weha qala sefera Erdoxan bo Amerîkayê kiriye:**

“Ez ji sala 1997’an pêve hertim bi heyetên siyasî ên Turkiyê re, çûme dervey welat, bi taybet bo Amerîkayê. Di sefera vê carê ya Erdoxan de eşkere bû ku ew dixwaze sitratejiyeke siyasî aborî ya giring bigre pêş, û bi Kurdan re têkilyên xwe geş bike”.

Wî di doma nivîsa xwe de nivîsandiye: “Erdoxan hewil dide ku hevdengiyê bi Kurdan re bidest bixe, û bê guman lihevhatina aboriya Enqere Hewlêr û hevdemgotûbêjên bi PKK renîşaneya vê yekê ne ku Erdoxan dixwaze di pêxema berjewendiya partiya xwe de wan têkiliyan bihêz bike”.

## Petrol kartek bihêz di destê Kurdên Sûriyê de




Kovara Amerîkayî ya “National Est”, di warê çavkaniyên perola Sûriyê de nivîsandiye: “Hêj beşek zaf ji zewiyên petrola deverên kurd akincî ên sûriyê nehatiye vedîtin û rewş bi awayekê ber bi pêşve diçe ku kurd li hevkêşeyên siyasî ên deverê de, kartekî nû bi navê petrolê dikeve dest wan de.

Dîwar Xinsî yek ji pisporên warê zewînasiyê li ser dewra petrolê li ser çarenivîsa kurd de dibêje: “Qasa paremayiya petrola Sûriyê di navbera 2 heya 3 milyard bermîl û qasa çavkaniyên gazê 241 milyard metir sêca ye, û piraniya wan çavkaniyan dikevin deverên kurd akincî ên vî welatî de. Li sala 1939 yekem bîra petrola vê deverê, li qerax bajarê Dêrik hat vedîtin û piştre li Mêlan, Xerbit, Sûye û Qirnişûk petrol hate vedîtin û bi giştî em dikarin bêjin %50 ji çavkaniyên petrola Sûriyê dikevin bakûrê rojawaya vî welatê de.

Ji sed salên derbaz bûyî de her tim em tevî vê rastiyê bûn ku petrol ji bo kurdan xincî bextreşiyê tu qazancek nebûye, lê va tê xuyakirin ku heke kurd hindik hişyar bin û bi pirsên siyasî re berbirû bibin, dikarin vê rewşê biguherin.

Ji bo mifahwergirtinê, em dê modêla Hewlêr bişopînin.

Aldar Xelîl, endameke desteya bilind ya kurdên Sûriyê li warê siyaset û pirogirama desteya bilind û PYD hevpêwend bi mifahwergirtina çavkaniyên petrola Mêlan de got: “Em dixwazin modêla herêma kurdistana Îraqê bişopînin, niha em naxwazin çavkaniyên petrolê li deverên kurd akincî bi tevahî di navbera kurdan de parve bikin, em li ser vê baweriyê ne ku dibe dahata petrolê biçe xezîneya netewî û piştî hatine ser kara sîstemeke nû ya siyasî li Sûryê de, ev dahate bi awayeke dadperwerane di navbera tevahiya hevwelatiyan de bê parvekirin.

Heke dijber daxwazên me qebûl neken....

Cefer Enan nûnerê PYD li herêma kurdistanê, li warê biryara PYD li ser petrola Mêlan de got: “Em dikarin ji rêya Turkiyê û herêma kurdistanê ve petrola bakûrê kurdistanê bifroşin, lê ji ber berçavgirtina hesta siyasî û asayşê, heya niha me petrol rê nekiriye, heke dijberên sûriyê daxwazên kurdan qebûl kirin û em bi fermî nas kirin, rêya şandina petrolê dê bidin, lê heke pêdagir bin li ser biryarên xwe, em rêya şandina petrolê nadin.

www.rewsakurdi.org



# Hevalbendiya Leşkerî Dijî Îranê

Dara Natiq



Li gorî nûçeyeke rojnameya Sandî Taymz, Îsraîl li gel Turkiyê û çend welatên din, ên Erebî, wek Îmarat, Ordon û Erebistanê li hev hatine ku zanyariyan bidin hevudin, û herweha li hemberî gefxwarin û tehlûkeyên mûşekên balistîk ên Îranê de, bi hevre Alîkariyê bikin, û mertaleke mûşekî a bihêz ava bikin, û teknolojiya dijî mûşekî a xwe bihêz bikin.

Ji aliyek din ve ew manovra leşkerî a Amerîkayê ku bi beşdariya 40 welatên hevpeyman di nav avên kendavê de bi emrazên herî pêşkevtî ên şerê dijî mûşekî û nawên behrî, û balafirên bê balafirvan birêve çûn, bê guman peyameke rohn in bo Îranê û zêderewî û gefxwarinên deshilatdarên vê rejîmê. Herweha peyamek rohn û zelal e bo Îranê bona vê ku di navbera pêşwazî ji şer û desthilgirtina ji programên xwe ên etomî, yek ji wan hilbijêre.

Di rastî de rejîma Komara Îslamiya Îranê bi sedema wan destêwerdanên di nav karûbarên welatên herêmê, û piştgîrîkirina ji terorîzma cîhanî, û ji hemiyan giringtir hewildan bo destpêregihîştina bi çekên etomî, bûye deshilatek ku ji bo welatên herêmê cihê tehlûkê û tirsê ye, û nahê qebûlkirin. Lewra welatên herêmê xwe amade dikin ku eniyek bihêz û hevalbendiyek herêmî û cîhanî bi dijî vê rejîmê pêk bînin.

Civaka cîhanî niha êdî tu bawer-iyek waha bi vê rejîmê nemaye û birêveçûna manovrên weha berfireh jî li kendavê de, nîşaneya vê yekê ne ku ew xwe bo her egerekê amade dikin. Ew kiryara welatên cîhanê nîşan dide ku Komara Îslamiya Îranê çiqas îzole bûye û mixabin li encama wan siyasetan de zirar û xisara herî zêde bûye para xelkê welatê me.

## Qehremanên Cînayetan



Van rojane bazara binav hilbijartina rejîmê germ e. Ew ji her riyek mumkin ve hewil dide rûçikek demokratîk û azad bona bazargermiyê bide nimayîşa xwe, lewre me dît karwanê berbijarên cinayetkare mekteba Xomênî dirêj bû. Eva bimîne ku parzînka Şêvra Nobedar a rejîmê dê wan ket û cot bike û renge ji wan 466 kesan, tenê kêrahatiya 10 kesan bipejirîne û kesê dilxwaze ku li nav sindoqên direwîn de derbixîne.

Lê ya girîng tevlîbûna Haşimî Refsencanî, pîre terorîstê 80 salî û kesên pile 2 ê Rejîmê bi refa karwanê berbijarên serkomariyê ye ku hevkêşeyên gurûpî û bandî ên nava rejîmê jî aloz û tûşî guhertinê û nirxandin û pêşdîtinên gelek ji çavdêrên siyasî jî tevlihev kir.

Kesek ku ceribîna du dewreyên serkomariyê li karnameya siyasî a xwe de tomar kiriye û li hemû xweşî û nexweşiyên temenê nîzamê de nexş û rol hebûye.

Lê serbarê pêşîneya pir ji cinayet û tepeserkaraneya wî bi taybetî li dewrana serkomariyê de, mixabin em dibînin ku hin kes, alî û gurûpan, bîrdanka dîrokî a xwe wunda kirine û bi hatina wî li kelecan û keyfxweşiyan de li kewilê xwe de cih nagrin û dixwazin bi înkara rastiyên dîrokî, rûçikek rizgarîder û qehreman ji Koseyê terorîst nîşan bidin.

Niha pirsiyar ew e kesek ku derbasbûyek bixwîn û pêşîneyek terorîstî li Îranê de li dijî xelkê û bi taybet kurdan hebe û yek ji sebebkarên wan hemû tawanan be, çawa ji hiçikên kirasê wî de, ''moicize''û dermanê rizgarkirina Îranê tê der? Ew yek ji mîmarên awahiyê şikestxwarî ê nîzamê ye û nikare li eniya demokrasîxwaz û civaka medenî de cih bigre. Ji ber ku ew beşek e ji bilûka desthilatê û li nav qopiya cinayetan de çeqiyaye. Kesek e ku hukmê dadgeha Mîkonosê li ser de heye û bi hêsanî nikare xwe jê bişo û bide bexşîn.

wLewma cihdana wî li nav refa tevgera nerazî a xelkê Îranê li dijî desthilatê û herweha bexşîna nîşana qehremanî û rizgariyê jêre, şaşiyek stratejîk e ku hin kes duhola wê dikutin vêca çi reformxwazên hikûmetî bin, çi opozîsyon be û çi jî texa rewşenbîr û bijardeyên civakê bin û ew dibe bersivder bin.

Dibe demokrasîxwazên Îranê û bi taybetî kurd şiyar bin û bi piyaleyek avê nekewine avjeniyê, çûnku nimayîşek han tu pêwendî bi wan ve nine û band û baskên pawanxwaze rejîmê ne ku li ser hêz û desthilata zêde rikeberiya hevdu dikin û rizgarkirina Îranê ji wan kirîz û metirsiyên ku gefek micid e li ser pêşeroja wê, tenê û tenê ji hêla xelkê azadîxwaz û neraziye Îranê tê kirin nek kalikê xurifî yan Îmam Zeman û Qehremanên cinayetan!




Selîm Zencîrî

Têdîtin: Ew gotar berî vê ku kêrhatiya (selahiyeta) Refsencanî bê retkirin, haiye nivîsandin.

www.arsivakurd.org



Îbrahîm Hecîcî xelkê Dere Hecîca ser bi herêma Hewramana Lehon ye. Li sala 1342'an (1963'an) ji dayîk bûye. Her li zarokatiya xwe de awareyê kurdistana Îraqê bûn û li Tewêlle akincî bûne, ji ber ku bavê wî li salên 1340'an (1961) pêwendî bi rêxistina veşartî a PDKÎ re hebûye, û piştî vê ku eşkere bûye, rû li Kurdistana Îraqê kiriye.



**Li "Gewre dê" gellek caran ez çûme xizmeta şehîd Dr. Qasimlo, û heta min cotek solên "Kilaş" jî, jêre çê kirin**

Birêz Îbrahîm Hecîcî weha bas ji jiyan û xebata xwe ya pêşmergatiyê kir:

"Min destpêkê li hocrê de ders xwand. Piştî heşt mehan min li xwendegeheke Tewêlle de navnûsî kir û heya pola pêncê min ders xwand.

Bavê min ji aliyê hikumeta Îraqê ve hate girtin û çar salan li girtîgeha Ebûxerîb hate zîndanîkirin. Piştre li Ehwazê tehwîlê Îranê hate dan, û sal û nîvekê jî li Îranê hate zîndanîkirin, lewra min dest ji xwendinê hilgirt û sala 1974'an ez, diya xwe û xûşka xwe, me çûne Îranê, û li Dere Hecîc û Serpêlî Zehaw de min dest bi xwendinê kir.
Li sala 1356'an (1978) li Tewêlle, min pêwendî bi Mihemd Seîd Kalkal ve girt, û bi awayek veşartî min karên hizbî kirin, heya wê demê ku PDKÎ xebata xwe ya eşkere ragehand.

Min hestek pirr xweş hebû, jiber ku PDKÎ xebata xwe ya eşkere dest pêkiribû. Piştî têkçûna şoreşa Barzanî ku Kurd bê hêvî bibûn, coşek taybet di derûna min de peyda bû.

Min li Alana Serdeştê de bo yekem car Dr. Qasimlo dît, ez û bavê xwe wê demê du sal bûn ku em ji yektir dûr bûn, ez li hêza Şerîfzade de bûm, û bavê min bi her du mamên min re, wate Se'dullah û Seîd, li binkeya Deftera Siyasî de bûn. Ez çûme serdana bavê xwe li Alana Serdeştê, û sergurd Elyar gote min ku me hewcehî bi te heye. Lewra li cem sergurd Elyar û li komîsyona pêşmerge de ez mam.

Êvariyekê gotne min ku li gel şehîd Mîrza Ebdulla Mişkolan demjimêr 3'ê sibêdehiyê herne nêzîk Qeladizê, û mêhvan ji me re tên. Em demjimêr 6'ê sibêdehiyê gihîştin cihê diyarîkirî. Li wir çavê min kete kesekî ku li nav refên Be'sê de bû, û pêştir mamostayê min bû li dema xwendina li Tewêle de. Me yektir nasî û piştî ji hev pirsînê, min gotê tu li vir çi dikî. Wî got ez berpirsyarê vê eniya şer im. Herweha wî got em dizanin ku mêhvanê we kî ye, ew hezkiriyê me ye jî, û ew jî Dr. Qasimlo ye. ji kêfxweşiyan rondik ji çavên min hatin xwar. Saet 7'ê sibêdehiyê bû ku Dr. Qasimlo gihîşte wir. Piştî ehwalpirsînê ew siwarî hesp bû û em jî pêş wî ketin heta em gihîştin cihekê bi navê "Genaw"ê, û li wir me dest bi amadekirina xwarin û danîna çayê kir, li wir Dr. Qasimlo bangî min kir û navê min pirsî. Piştî vê ku min gotê ez kurê mam Tahir im, li bersivê de gote min ku Hecîcî daxwaza çi dikin, xwe hûn xwedî otonom. Min jî gotê bibore, lê em hatine ku we hînî Kurdatiyê bikin!. Piştî vê heyamê li "Gewre dê" gellek caran ez çûme xizmeta wî, û heta min cotek solên "Kilaş" jî, jêre çê kirin.

Nasîna min bi Dr. Seîd re jî li Alana Serdeştê de bû. Dema ku ez bi serwan Celalî û Sergord Elyar re, em çûne cemFetah Kawyan ku li jêr xîvetê de bû, Dr. Seîd jî li wir bû. Pirtûkek di destên wî de bû, û mijûlî qedem lêdanê bû. Em çûne jor de, me silav kir, lê wî bersiv neda, Fetah Kawyan gote min tu Îbrahîm Hecîcî yî, min gotê belê qurban. Gote min ku te bi îzna kî teqemenî ji hikumetê wergirtiye, min gotê qurban em bê fîşek mabûn, min jî kesek nas dikir, lewra me daxwaza teqemeniyê kir. Dr. Seîd got divêt ew bê cezakirin. Min jî gotê ku sergord Elyar û endamên komîsyona pêşmerge ji vê mesewlê agehdar bûne.

Sergord gote min tu dizanî eva kî ye, min got ne, got eva Dr. Seîd endamê Deftera Siyasî ye. Piştî çend rojan Dr. Seîd ez bo karek taybet bang kirme Deftera Siyasî. Ez çûme wir û Dr. Seîd li wir bû. Min silav kir û wî jî bersiva min da û çû serê min, û gote min: " kurê min, tu heq bûyî". Ez piştî wê hertim diçûme cem wî li Gewre dê li binkeya Radyoyê".

**Wî derheq pêkanîna jiyana hevbeş jî weha gotî:**

"Ez şeva Yelda ya sala 1366'an (1988'an) bi hevjîna xwe ya niha wate Nafie re zewicîm, û niha me sê zarok hene. Ez pirr sipasdarê hevjîna xwe me, ku çendî n sal e bi min re ye û zehmetê dikêşe".

Hevpeyvîn:Faxir Molûdî



www.arsivakurd.org

# Îran pileya yekem di warê revîna mêjiyan di cîhanê de heye



5 milyon xwendekar li derveyî Îranê de ne û Îran pileya yekem di revîna mêjiyan di cîhanê de heye
Kurdistanedia: Xwendekarên Îranî di wan salên daviyê de, vî welatî bi cî dihêlin û rû li welatên bîhanî dikin.

Sindûqa navneteweyî ya dirav ragehand, ku di pêwendî tevî revîna bijarde û qata xwendekaran, Îran di pileya yekemîn de ye, û ragehand ku 4 heya 5 milyon Îranî ku weke bijarde û qata xwendekar tên hesibandin li 22 welatên bîhanî de jiyana xwe derbaz dikin. Li welatê Amerîka yek milyon û 400 hezar kes, Îmaretîn hevgirtî yên Erebî 800 hezar kes, Birîtaniya û Kanada her yek ji wan 410 hezar kes, Alman 200 hezar kes, Feranse 155 hezar kes, Swîd 110 hezar kes bijarde û xwendekarên Îranî jiyan dikin.

Eva jî di demekê de ye ku serkomarê rejîma Îranê her tim wan amaran bi direv dizane û li ser wê baweriyê ye ku bikaranîna têgeha revîna mêjiyan tiştek direv e.

Her di vê pêwendiyê de karnas û civaknas, li ser vê baweriyê ne ku, Îran ji bo bijarde û xwendekaran mîna girtîgehê tê hesibandin, lewra welatê xwe bi cî dihêlin.

Pêka amara nawenda zanista mirovî a Îranê, piraniya wan kesan ku ji Îranê direvin, temenê wan di navbera 22 heya 30 salî de ye. Her pêka amara nawenda han, di salê de 150 heya 180 hezar Îranî, bi merema xwendinê diçine welatên biyanî.

# Kedkarên Kurd û jiyana dijwar



Li Kurdistana Îranê kedkar û zehmetkêşên kurd di bin zext û zorên pirr dijwar jiyanê derbas dikin. Roj li pey rojê pirsgirêk û astengên kar û jiyana karkeran zêde dibin. Tu mafek qanûnî û sendîkayî yên karkeran nayê parastin. Her diçe bêkarî bêhtir dibe. Bi hezaran kedkar ji ber kirîza aborî û ambargoyên navneteweyî li Komara Îslamî ji kar tên derxistin. Meaş û mehaneya karkeran çend mehan nayê dayîn. Paşdexistina mehane û mûçeyê kedkaran bandoreke rasterast kiriye ser rewşa jiyan û derbaskirina karker û malbatên wan.
Evna tenê kunceke biçûk ji dehan pirsgirêk û astengên ciddî ne ku karker rojane bi wan re rûbirû ne. kedkarên ku hemû sibêdeyan bi hêviya peydakirina pirtikek nan û dabînkirina debara malbatên xwe ligel hemû dijwariyan kar dikin û pirr car jî kar dest wan nakeve.
Li Kurdistana Îranê rewş bi tevahî cuda ye. 34 sal e ku Kurdistan weke herêmeke ewlehî û leşkerî hatiye kirin û rewşa awarte ya ne rasterast li Kurdistanê hatiye cihgirkirin û tu projeyeke mezin û bi kêr li bajarên Kurdistana Îranê ji aliyê dewletê ve nayên cîbicîkirin. Sedem jî hebûna tevgera rizgarîxwaziya gelê kurd e ku heta niha jî partiyên siyasî yên kurdî li ser xwestek û mafê demokratîk yên kurdan li Îranê mikur in. Ev yek bûye sebeb ku rejîma Îranê, Kurdistanê weke herêmeke bêpar di ware aborî de bihêle û bêkarî û nebûna derfetên kar pirsgirêkeke mezin ya hemû hevwelatiyên kurd li Kurdistanê de ye. Di vê navberê de xwendekarên ku zanîngeh jî qedandine li Kurdistanê nikarin kar peyda bikin.
Bingeheke van pirsgirêkan vedigere bo nebûna edaleta civakî û yeksaniya aborî di navbera hemû herêmên Îranê de. Bi awayekê ku li gor serhejmêriyên hikûmetê û rayedaran, li 4 parêzgehên kurdan li Îranê, rêjeya bêkariyê îsal gihîştiye ji sedî 40'î. Ev çar parêzgeh, herêmên herî hejar û xizan ên Îranê ne di warê aborî û sermayedanînê. Heta siyaseta ewlehîkirina herêmên Kurdistana Îranê neyê guhertin, îmkana çareserbûna van pirsgirêkan zehmet e. Sedema sereke jî liv û tevgerên dijî gelî yên karbidestên Komara Îslamî ya Îranê ne ku dixwazin deverên kurd lê dijîn, bêpar bikin û paşvemayî bihêlin.
Di rastî de bo ji holêrakirina ne wekhevî, û bê edaletiya eşkere ya Komara Îslamî li hemberî kedkarên seranserê Îranê û bitaybetî yên kurd, hewcehî bi yekîtî û hevgirtina hemû tex û çînên kedkar û zehmetkêş heye, û heta sîstemeke demokratîk û xelkî nehête serkar, dadperwerî nikare di welatê me de cihgir be.


Xobî Emînî

# Bîl Gîts, bû kesê herî dewlemend ê cîhanê


Bîl Gîts kesê herî dewlemend

Bîl Gîts avakerê kompaniya Maykrosaft, bi hebûna 72.7 milyard dolarî karî ku carek din bibe kesê herî dewlemend ê cîhanê.
Navbirî li sala 2007'an de jî bibû kesê herî dewlemend ê cîhanê, û wê demê 65 milyard dolar hebû. Ew ku 57 salî ye, îsal 10 milyard dolarên din jî hate ser perê wî.

Li hember de serweta Karlos Selîmê temen 73 salî, û xwediyê kompaniya mezin ya muxabiratî ya bi navê "Amrîka Mûyl" jî 72.1 milyard dolar hate texmîn kirin.

www.civakurd.org

# Şênwarên Dîrokî Ên Kurdistanê Li Jêr Siya Rejîma Îranê De



Îdrîs Sitwet



Mîratên çandî, nasnameya netewe, civak û xelkê nîşan didin û nîşaneya çawaniya jiyan kirina civaka berî me û rêyek ji bo naskirina dab û nerîtên berê, û bawerî û hewl û tekoşîna mirov ji bo mana xwe û zalbûn bi ser xwezayê de ye.

Welatê me Kurdistan ji welatekê kevn û dîrokî ye û her di rojgarên kevnar de cihê jiyana xelkê curbicur bûye û wek welatek ku xwediyê çandeke dewlemend e di nava şaristaniyetên cîhanê de ye, tê xuyakirin gellek şûnwarên dîrokî têde hene, Wek: "li parêzgeha Kirmanşan Taqwesan, Şikefta Qorî Qela, ketîbeya Bêstûn, me'beda Anahîta ...hwd, li parêzgeha kurdistan kelha Zîwiye, şkefta Kereftû, Text Silêman, ketîbeyên Tengîwer, kelha Qîlantû, û li parêzgeha Urmiyê kelha Bêrdûkê, kelha Telaw, kelha sê gunbed, kilîsaya Nenê Miryem, kelha Dimdim.... hwd. Mixabin hin paşmaweyiyên wan şûnwarên dirokî, xincî vê ku hindek bi lehî û ba û baranê herifîne, hin jî ji aliyê dijberên neteweya kurd ve hatine jinavbirin, mîna kelha Dimdim a Xanê Lepzêrîn, û hin jî ji aliyên dagîrkerên kurdistanê vê hatine dizîn û firotin. Di rastî de komara Îslamî tu giringiyê nade şûnwarên kevnare neteweyên din, û di cihê vê ku wan biparêze, wan ji nav dibe. heta mîrata çandî ya gundê "Goptepe" ya parêzgeha Urmiyê ji aliyê hin kesên nenas ve hatiye talankirin û heya niha çend carî tiştên kevnare gundê han bi talan birine. Niha mîratên çandî ên kurdistanê tehlûkeya herifînê li ser heye, weke zanîngeha pizişkî ya Urmiyê ku li sala 1267'an (1888) ji aliyê "Dr. Jozêv Kakran" ve hatiye çêkirin, û kilîsaya gundê Goptepe û ...hwd.

Di rastî de giringîdan bi wan mîratên çandî û parastina wan li hember jinavçûnê erkê dewletan e. Lê mixabin em di welatekî de dijîn ku karbidestên deshelatdar di vî welatî de li ser dizîn û jinavbirina şûnwarên kevnar ên welatê me, rikeberiyê bi hevre dikin. Lewra vê demê em dikarin xatircem bin ji parastina wan şûnwaran ku deshilatek demokratîk û xelkî bête ser kar.

# Gotinên Pêşînan

A: Çiya Mazî



**Dîn nêçîrvanê aqil e :**

Mirovê dîn aqil ji wan re wekî holîka sêlekan e. Tiştên ku bi aqil bi hiş çêdibin ji wan re ne pêwist e. Herwiha bi aqil dilîzin û wî perçe perçe dikin. Bi piranî tiştên derî aqilan dikin tiştên ku mirovê saxlem nakin ew dikin.

**Dinya bi dorê ye, ne bi zorê yê:**

Wekî em dizanin dinya dizîvire an tu dem di cîhê xwe de nasekine çerxa felekê jî her ti li dor xwe û li dor tavê dizîvire. Ji ber wî yekî jî ew bawerî heye ku wê dora hertiştî bê.

Dinya bi gulekê nabe bihar:
Her tişt wiha ye, ne dinya bi gulekê dibe bihar ne temen bi salekê diqede, ne mirov di salekê de mezin dibe û ne tu tişt bi nêvî nabe ku mirov jê re bibêje temam e.

**Dinya bûye kes, kesî negotiye bes:**

Dinya dara hisretê ye.
Wekî mirov li dinyê be ,her tim mirov hisreta tiştekî dikişîne. Mirov her tim dixwaze tiştekî bike an tiştekî ji xwe re dike armanc. Hertim bi hisreta pêşketinê ye.

**Dinya gulek e, bêhn bik û bid hevalê xwe:**

Dinya gulek e, dinya xweş e. Divê vê dinya xweş û şêrîn mirov ji herkesî re bixwaze. Mirov ji hevalê xwe jî re bixwaze.

# *Avakirina erşîva çavkaniyan bona parastina fulklora Kurdî hewce ye*




**P. Dr. Celîlêî Celîl: hewil bona parastina şûnwarên dîrokî hatiye dan, lê ...**

**Celîlê Celîl mamostayê zimanê Kurdî û şarezayê çand û Kurdnasiyê, û akinciyê Ermenistanê, roja 17'ê Gulanê di civînekê de li Bajarê Amedê, pêdagirî li ser avakirina arşîva çavkaniyan bona parasitina fulkilora Kurdî kir.**

Navbirî pişî amaje kirin bi vê yekê ku beşek zaf ji helbestan, û heta şûnwarên çanda Kurdî bi dirêjahiya zeman, berev jinavçûnê çûne ragehand ku, zeman dujminê fulkilorê ye û bileziya guherînkariyan îro bûye sedema aloziya peywendiyan, û di vê navberê de jî eva ku bi bêdengî jinav diçe, fulkilor û keltûra kolan û bazaran in.

Pro. Celîl Celîl di dirêjiya gotinên xwe de got; "Renge kesanek hebin ku hewlên xwe di vê peywendiyê de xistibin kar, lê ev hewil berdewan nebûne û bê haydariya hevdu û gelek bi neşarezayî û bê zaniyarî derheq çawaniya dîroknivîsî û parastina arşîvan, hewil dane".

Celîlê celîl di dawiya gotinên xwe de daxwaz ji binyatên Kurdî kir ku giringiyê bidne arşîv û çavkaniyên çandî, û herweha, ragehand ku dibe enistîtoya Kurd û binyatên keltûrî bi hevbîrî û hevkariya hevdu, weke hewcehiyek rojê, di pêxema parastina çand û filkilora Kurdî de hewil bidin û gelaleyek guncav bona çavkaniyek weha mezin dabirêjin.


www.arsivakurdi.org



A: Adil Muradî

# Şaristana Selasa bawecanî

**Bi sedema vê ku sê tayfên naskirî bi navên Bawecanî, Weledbêygî û Qubadî li wê herêmê de jiyan kirine, levra ev şaristan bi şaristana Selasa bawecanî tê naskirin**



Rûberê şaristana Selasa Bawecanî 1920 kîlomera çargûşe ye û li bakûra rojawaya parêzgeha Kirmanşahê hilketiye.

Li aliyê bakûr û rojhelat li gel şaristana Ciwanro û li aliyê başûr li gel şaristanên Dalahû û Srpêla Zehaw û li aliyê rojawa li gel Îraqê hev sînor e.

Li gorî serjimêriya sala 1385'an(2006) nifûsa vê şaristanê 38.605 kes e.

Ev şaristan ji du bajarên "Tazeawa" û "Ezgile" pêk tê.

Bi sedema vê ku sê tayfên naskirî bi navên Bawecanî, Weledbêygî û Qubadî li wê herêmê de jiyan kirine, levra ev şaristan bi şaristana Selasa bawecanî tê naskirin.

Dahata xelkê wê herêmê ji cotkarî, pezdarî û baxewaniyê bi dest tê.

Ji şûnwarên kevn û cihên torîstî ên wê şaristanê, em dikarin qala wan ciyan bikin: Bajarê dîrokî yê Dirne, Serawa kanî sefer, kaniya şefabexş ya Rêze, serawa şiyan ya Mîrawa, serawa Hewlê, sûlava şêx Salih, baxê Seyîdxan, kelha gûndê Nigre, Dê Şêx û Mîrawa.

Herwusa çiyayên wê ev in: Dalahû, Benîgez, Saron, Garî.

Rûbarên şaristana Selasa Bawecanî jî ev in: Rûbarê Zimkan, Çem Zirişk, Darzengene, Hewesan.

## Zimanê Kurdî jî çû rêzbenda zimanên fermî ên cîhanê

Zimanê Kurdî ji aliyê kompaniya "Gilosp" ve bi zimanek fermî ê cîhanê hate naskirin û çû nava rêzbena 128 zimanên cîhanê.

Kompaniya Gilosp ku ji aliyê civaka navneteweyî ve rê pê hatiye dan ku li ser asta cîhanê çalakiyan bike, bi awayek fermî zimanê Kurdî bi beşa zimanên çandî ve zêde kir.

Eva jî berhema hewl û mandîbûna 10 mamostayên zanîngehê û hejmarek xwendekarên Kurd e ku, bona vî karî heyamek zaf e digel kompaniya navbirî di peywendiyê de ne.

Hewceyî basê ye ku heyamek berî niha jî tora civakî a Facebookê jî zimanê Kurdî bi rîzbenda zimanê xwe ên fermî ve zêde kir.




www.arsivakurdi.org

# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792


## Abrûyê serkomara Kastarîkayê çû



Serkomara Kastarîkayê bi sedema nebûna balafira taybet a serkomariyê û bi mifahwergirtin ji balafira qaçaxçiyekê di dema geştek xwe de, digel abrûçûna xwe ya herî mezin berbirû bû.

Jêderan eşkere kir ku serkomara vî welatî "Lora Çînçîla" xwediyê balafira xwe ya taybet nine û bona geştên xwe ên navdewletî, ji du balafiran mifah wergirtiye ku xwediyê wan "Gabriyêl Mowarlîsî" bazirganek mezin ê madeyên hişber e.

Piştî belavbûna nûçeya han serokê dezgeha îtilaat û asayişê "Marîko Borasaçî" û "Ayrin Paçîko" dostyarê serkomara welat û herweha wezîrê peywendiyên Kastarîkayê "Firansîsko Çakon", dest ji karê xwe berdan.

**Pêşniyara NY :**

## Dest bi xwarina mêhrûyan (mostankan) bikin

Piştî kêmbûna xûrakê di cîhanê de, NY pêşniyar dike ku xelkê cîhanê bila xwarina mêhrûyan dest pê bikin.
Li gorî nûçeyan, beşa xûrak û çandiniyê ya NY, (Fao) li raporekê de ragehandiye ku li encama kêmbûna xûraka asayî de, zêdetir ji 2 Milyard kesî li cîhanê de dest kirine bi xwarina yek hezar cur ji mêhrûyên curbicur, bi taybetî li welatên Amerîka, Asyaya dûr, Afrîqa, Ostraliya û Niyozlendê.
Di vê pêşniyara NY de hatiye ragehandin ku xwarina mêhrûyan gellek qazanc heye, û piroteîn û maddeyên kanzayî ên baş têde hene, û ji bo wan zarokên ku ji destê kêm xwarinê de dinalînin, pirr baş e.



## Mobayla taybet bi zarokan jî derket bazarê

Bona parastina zarokên kêm temen di dema rûdana her cure metirsî û tehlûkeyekê û herweha bi hêsanî haydarkirina dayîk û bavên xwe ji rewşê, mobaylek taybet bi navê "Stfone 1" derket holê.

Ev mobayla han ku kêşa vê 40 girem e û bona zarokên 4 heya 9 salî hatiye çêkirin, dikare di dema rûdana her cure tehlûke û matirsiyekê de, ji rêye lêdana her pişkekê (dokmeyekê) ve, dayk, bav, polîs û herweha kesên ku navê wan di mobaylê de hatine parastin, haydar bike û hişdariyê bide wan.

"Stfone 1" xwediyê peywendiya întêrnêt, sîstema kurte peyam û nermamêrên din e.




www.arsivakurd.org